

Hevalê hevalên xwe be

Nûşîn Bêcirmanî

Ji kevin ve , di nav Kurdan de – nemaze li Kurdistana bakur - di her herêm û gundekî de, berê dubendî hebû û ew bixwe jî hevrikî û dijminatî bû . Ez dixwazim serpêhatiyekê li ser dubendiyê weke min bihîstiyê li ber we deynim.

Li Hêştirekê, gudekî ji gundên Torê ye, wekû hemî gundan dubendî tê de hebû, benda Dorikan (Hevêrkî bûn) û benda Etmanka, û herdû bend jî ji bav kalan de neyarê hev bûn ta radeya ku goristanên wan jî ji hev cuda bûn. Mirad ji benda Dorika bû û jê re digotin(Kilot). Carekê ji caran Kilot karwanek amade kir û ber bi bakur de çû. Êvar bi ser wan de hat, wan jî berê xwe dane gundekî nêzîk û di rê de ji hev re digotin em ê li oda axê razin. Kilot xwest ji wan re bidê xuyakirin ku axa bi xwe Etmankî ye û ji ber vê yekê jî wî nedixwest herne odê , lê ya Kilot û hevalên wî ne bû yek. Kilot sûnd xwar û got: Ez bi wî Pîr Kurêşê , ku heft bar di bin sêndera deriyê wî re derbas dibin, sûnd dixwim ta maleke hevêrkî li gund hebê ez li oda Etmanka ranazim. Ewan berê xwe dane odê lê Kilot çû li malên hevêrkan pirsî. Mixabin tu malên hevêrka rê nedanê ku wê şevê li ba wan razê.

Kilotê reben bê çare ma û bi dilekî şikestî berê xwe da odê . Li derbasbûnê silav li Axê û yên dora wî kir û bi melûlî li ber derî rûnişt. Hevalên wî di ber xwe de pê kenyan. Axê dengê kenê wan kir û ji wan pirsî : Ma çî heye win pê dikenin!? Di bersiva xwe de wan jî çîroka xwe û Kilot jê re gotin. Piştî Axê çîrok bihîst, Kilot di çavên wî de mezin bû û jê re got : Kilot cihê te ne li wir e!

Tu were li rex min rûne. Ev jî weke xelatekê bû ji Kilot re ji bal axê ve. Axê berdewam kir : kesên wisa ne pêkenok in lê

ew cihê serbilindiyê ne !! Axê şîv ji wan re xwest û li ber Kilot danî û ji hevalên wî xwest werin pê re bixwin. Di dawî de Axê da xuyakirin ku yê hevalê hevalên xwe be, her û her ew cihê rêzgirtinê ye.

Dumahîk : Rêwresma....

Derdê te jî ê mezin welat e

Belê çûn û dûriya mamoste Smayîl Omer ji nêv refên heval, xebatker û welatperweran dilê her Kurdekî bi pêtên agirê wê dûriyê sotaye.

Lê ma em çî bikin li hember vê qedera rûreş? ku bi miletê me re bi kîn e, zû zû davik û çeperên xwe bi tundî li ber siyasetvan û rewşenbîran veda ye -ewên ku hîna pêwestiya welat û miletê me bi xebat û pênuşa wan heye- û wan ji wê xebata pîroz bê par dihêle.

Bi helkeftina çilrojîya koça dawî ya mamoste Bavê Şiyar re, bi dilekî xemgîn dibêjim: Bere serê gelê Kurd, heval, malbat û hezkiriyên Bavê Şiyar sax be û bi hevalên doza xwe re di buhuştê de cîwar be.

Samî Ehmed Namî

Stockholm. 2010.11.26

Bi derbasbûna çelrojîya Mamostayê nemir Ismaîl Umer Srokê Partiya yekîtiya ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê, ez bi navê malbata Cegerxwîn careke dî sersaxiya Partiya yekîtiya Demoqrat a kurd li Sûriyê , malbata nemir , heval û dostên wî dikim û bila serê we hemiyar sax be û cihê wî bihişt be.

Mabata Cegerxwîn Kesra

Stockholm 25.11.2010

Lêborîn :

Di hejmara 94 an Ya weşana NEWROZê de, gotina Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê ji hêla sekretêrê me, birêz Mihyedîn Şêx Alî ve hatibû pêşkêşkirin